

Maahanmuuttajien Varautumis- ja Maanpuolustusyhdistys
(MVM)ry:n jäsenlehti

KANTAMA

NRO 5 | TEBAX 2026

DENGÊ CIWANAN

Dema ku xizmet hêj
dest pê kiriye

PEYAMA RÊVEBERÊ GIŞTÎ

Dema ku hêza civakê li ser
baweriyê tê avakirin

BANGEWAZÎ

Ji bo destpêka xizmetê agahî, ezmûn û
derfet



NAVEROK

Tebax 2026 | Nro 5

03

PEYAMA RÊVEBERÊ
GIŞTÎ

04

SERGOTAR

05

Dîtina Şareza

07

Bûyer

08

Rojev

09

Dengê Jinan

10

Şîretên amadebaşiyê

11

Dengê Ciwanan

12

Ferhenga Ewlehiyê



**Ewlehî ya her kesî
ye – beşdar bibe!**

Wekî endam, tu ne tenê
beşdarî çalakiyan dibî, lê
tu dikarî fêr bibî, beşdar
bibe û bi yên din re
Fînlandiyeke ewletir
ava bikî.

Serlêdana endamtiyê bi şopandina
koda QR tije bike.

Zêdetir agahdarî:
toimisto@mvmry.fi
www.mvmry.fi



Kovara Kantama bi piştgiriya Weqfa
Alîkariya Parastina Niştimanî û Weqfa
Komeleyên Parastina Niştimanî tê
amadekirin.



Maanpuolustuksen
kannatussäätiö



Şaho Caf,
Rêveberê Giştî yê Komeleya MYM

Peyama Rêveberê Giştî

Çi civakeke azad û demokratîk ji wê civaka ku bi tirsê tê birêvebirin vediqetîne? Bersiv tenê di sindoqên dangan an jî dezgehan de nîne, belkî beriya her tiştî di awayê tevgera dewletê bi mirov re ye: Gelo wekî welatîyek û avakarê ewlehiya giştî tê dîtin an tenê wekî binketekî guhdêr ku erka wî tenê guhdariya bêçûndûçûn e?

Li Fîrlandiyayê, bingeş û rehên ewlehiya giştîgîr bi tundî li ser baweriya welatîyan û erka parastina niştimanî radiweste. Digel vê yekê, bangkirina ji bo xizmetê bi wateya bindestkirina mirov wekî beşek ji mekîneyekê an amûrekê ji bo desthilatê nîne.

“
Civakeke xurt ne hewce ye ku welatîyên xwe bitirsîne da ku ew xizmet bikin.

XIZMET Û BERPIRSIYARÎ— DEMA KU HÊZA CIVAKÊ LI SER BAWERIYÊ TÊ AVAKIRIN

Di dewleteke yasayî û demokratîk de, erk li ser bingeşa yasa, wekhevî û berpirsiyariya hevpar ji bo siberojeke ewle hatine avakirin. Dewlet ne xwediyê welatîyê ye – belkî xwediyê welatîyê bi xwe beşek ji dewletê ye, ku li kêleka mafên xwe re, erka wî li ser e ku para xwe ji bo berjewendiya giştî pêk bîne.

Ji ber vê sedemê ye ku amadebaşî û parastina niştimanî beriya her tiştî bilindtirîn derketina welatibûn û berpirsiyariya giştî ne, ne nîşana xwebidestdanê ye. Ciwanekî fînlandî xizmeta partiyekê, rêberekî an îdeolojiyekê nake, belkî parastina azadî, demkrasiyê, dewleta yasayî û niştimaneke ewle dike. Li vir em ji civakekê diparêzin ku perwerde, kar, azadiya derbirînê û mafê avakirina pêşerojeke dilxwazî ji bo hemûyan peyda dike.

Di sîstemên totalîter de, xizmet dibe amûrek ji bo tirs û îdeolojiya ku pê dilsoziya bi dîktator re tê pîvan. Li wir mirov tenê dibe amûrek ji bo gihîştina armancên desthilatdaran.

Li vir e ku ciyawaziya bingeşîn xwe veşartîye: Mijar ne tenê ew e ku erk hene, belkî ew e ku armanca wan çî ye û kê wan diyar dike. Civakeke xurt ne pêwîstî bi tirsandinê an zextê heye. Ew civak baweriyê tîne, xweoragiriya derûnî ya qeyranê xurt dike û bi bîr dixê ku parastina civakê û azadiya xwe, her dem gaveke ji bo pêşeroja xwe û kesên xwe yên xoşewîst.

Ev hêza rastîn a demokrasî û ewlehiya giştîgîr e: Ev yek daxwaza parastina xaka hevpar bi rêya pabendbûna xwebexşane û baweriya hevdu dirust dike.

PENABER BEŞEK JI PARASTINA NIŞTIMANÎ YA FÎNLANDIYAYÊ NE.



Îradeya parastina niştimanî ji welatê jidayikbûnê çavkaniyê nagire. Ew ji xwedîtiyê, baweriyê û wê ezmûnê çêdibe ku ev civak civaka min bixwe ye – û ez dikarim bi beşdariya xwe bikim cihê ewletir.

Ewlehiya Fînlândiyayê li ser milê mirovan tê avakirin. Çiqasî hejmara ew kesên ku civaka Fînlândiyayê wekî ya xwe dibînin, bawerîya wan bi dezgehane heye û xwe wekî endamên wekhev di civakê de dibînin zêdetir be, xweoragîrî li hemberî qeyranê di wê civakê de xurttir dibe.

Ev mijar hemû niştecihan – di nav de penaberan jî – digire ber xwe. Li gorî amarên Dezgeha Amarî ya Navendî (Tilastokeskus), di dawîya sala 2025an de 660.800 kes bi paşxaneyê biyanî li Fînlândiyayê dijiyan ku li hemberî %11.7 ê giştî nifûsê bû. Beşdariya wan di ewlehiya giştîgîr a Fînlândiyayê de mijareke alî nîne. Ew beşeke sereke ye ji ewlehiya me ya hevpar.

Digel vê yekê, îradeya parastina niştimanî tenê bi wateya parastina çekdarî nîne. Belkî bi wateya amadebûna ji bo girtina berpirsiyariyê li hemberî civaka hevpar e. Ev dikare amadebaşî, çalakiya xwebexşane, rizgariya seretayî, peywendî, wergerandin, lojîstîk, ewlehiya sîberî, parastina sivîl an bi hêsanî amadebûna ji bo alîkariya kesên din dema ku civak bi qeyranê re rû bi rû dimîne, di nava xwe de bihewîne.

Lêkolînek ku di sala 2024an de li Zanîngeha Niştimanî ya Parastinê (Maanpuolustuskorkeakoulu) bi dawî bû, peywendîya di navbera hesta xwedîtiya ciwanan û nerînên parastina niştimanî de nîşan da. Çiqasî mirov zêdetir hîs bike ku ser bi civakê ve ye, nerînên wî yê parastina niştimanî jî erênîtir dibin.

Bê guman penaber komeke yekdest û yekgirtî pêk nayînin. Paşxane, ezmûn û xalên destpêkê yê kesan cîawaz in. Hin ji wan dibe ku ezmûna wan di şer, zordestî an sîstema xwesepîn de hebe. Ev ezmûn dibe ku qelsiyê zêde bikin, lê herwiha dikarin hişyariya qeyranê, şiyana mayînê û têgihîştina girîngiya civakeke ewle xurt bikin.

Ji ber vê yekê divê em bipirsin: Gelo em dixwazin penaber tenê bibin beşek ji niştecihên Fînlândiyayê an em dixwazin hîs bikin ku ew beşek ji civaka Fînlândiyayê ne – berpirsiyar û avakarên wê ne?

Li vir Komeleya MVM ry erka xwe ya girîng heye. Em pîreyan di navbera komên penaberan, berpirsan û rêxistinên parastina niştimanî de çêdikin. Bi riya xûlên perwerdehiyê, civînên zanyariyan û kovara pîrzimanî ya KANTAMA, em dixwazin amadebaşî, parastina niştimanî û ewlehiya giştîgîr a Fînlândiyayê ji bo pîrraniya kesan fêmkirî û berdest bikin.

Di dawiyê de, mijar gelek hêsan e: Dema ku mirov dikare bibêje: «Ev jî civaka min e», sedemeke wê ya biheztir heye ji bo ku bibêje: «Ez dixwazim di avakirin û parastina wê de jî beşdar bim.»

Ewlehiya Fînlândiyayê ne erka kesekî din e. Ev pîrsgirêka hevpar a me hemûyan e. Civaka me pêwîstiya bi me heye – û em jî pêwîstiya me bi civaka xwe heye.



XIZMETA LEŞKERÎ Û BANGEWAZÎ

*Serdarê duyem, ST Ilkka Ikonen
Rêveberê Ofîsa Herêmî ya Uusimaayê*

Li gorî qanûna Fîlandiyayê, hemû welatiyekî fîlandî neçar e parastina niştimanî bike. Mêrên fîlandî neçar in ji destpêka wê salê ku temenê wan dibe 18 sal heta dawiya wê salê ku temenê wan dibe 65 sal, beşdarî parastina çekdarî ya Fîlandiyayê bibin. Li Fîlandiyayê jinan ji sala 1995an ve derfet heye ku bi xwebexşî xizmetê bikin. Erka leşkerî dikare di xizmeta leşkerî ya çekdar de an bêçek de an jî di xizmeta sîvil (siviilpalvelus) de pêk were. Beşdariya di bangewaziyên de û kontrola şiyana xizmetê de, beşek ji erka leşkerî ye. Cîbicîkirina erka leşkerî pêk tê ji xizmeta leşkerî û manîvreyên dubare yên yedek (reservi). Bi riya van amadebaşî tê kirin ku di dema qeyraneke muhtemel de, kesên erkdar di dema pêwîstiyê de ji bo serxwebûna Fîlandiyayê bi çek parastinê bikin.

Civaka Fîlandiyayê hêjayî parastinê ye. Em xwediye demokrasiyeke karîger in ku tê de her kesek di dema xwestinê de derfeta wî heye ku bandorê li ser geşepêdana civakê bike. Li Fîlandiyayê torên piştevaniya civakê alîkariya wan kesan jî dikin ku ji aliyê xala destpêkê ve di pêgeheke qels de ne.

Bangewazî
hevdîtinek û
derfetek e ku
mirov dikare wekî
beşek ji parastina
niştimanî riya xwe
ava bike.

“

Bê guman li Fîlandiyayê jî tişt ji bo çêkirinê hene, lê li vir her kes dikare bê tirsê rûbirûbûna bi lêpirsînê ve, beşdarî guhertinan bibe. Erka leşkerî ya fîlandî piştgiya xurt a girseyî heye. Nêzîkî %80 ê fîlandiyan piştgiya sîstema niha ya leşkerî dikin ku yedeka pêwîst ji bo parastina Fîlandiyayê misoger dike. Li deverên din ên Ewropayê jî di salên çûyî de zivirîne ser bîrdoziya sîstema leşkerî, ku ya dawî di destpêka meha Tebaxê de Danîmarkayê dema xizmeta leşkerî ji çar mehan ve guherand 11 mehan.

Wekî endamê NATOyê, di dema pêwîstiyê de em alîkariyê ji welatên din ên hevalbend digirin, lê di nava NATOyê de tê xwestin ku her dewlet bi xwe çavdêriya avakirina şiyana parastina xwe bike. Ji bo neteweyeke piçûk, xizmeta leşkerî ya giştî tenê rêbaza mesref-bandor e ji bo parastina şiyana parastinê ya pêbawer. Fîlandiyayê pêwîstiya xwe bi hemû kesên şiyar heye di erkên parastina niştimanî de, daku ewlehiya giştî ya civakê were misogeririn.

PÊNGAVA BANGEWAZIYÊ GAV BI GAV

Nexşeya jêrîn pêvajoya bangewaziyê gav bi gav nîşan dide – ji hatina nameya bangewaziyê ve heta destpêkirina xizmeta leşkerî.

Beriya rûniştina bangewaziyê

Nameya bangewaziyê: Kesê ku tê bangkirin di wê salê de ku temenê dibe 18 salî, fermana beşdariya di bangewaziyê de bi riya posteyê werdigire. Nameyên bangewaziyê bi gelemperî di heyama destpêka salê de tên şandin.

Kontrola tenduristiyê ya pêşwext: Beriya bangewaziyê kontrola bijîşkî ya pêşwext di tenduristiya xwendekaran an tenduristiya giştî de tê kirin. Rêbernameyên kontrola tenduristiyê bi posteya bangewaziyê re tên.

Di rûniştina bangewaziyê de

Hatiniya û kontrola agahdariyên kesane.

Zanyarî derbarê bangewazî û xizmeta leşkerî de.

Di dema pêwîstiyê de, hevdîtin bi bijîşk re û nirxandina şiyana xizmetê.

Di komîteya bangewaziyê de

Di komîteya bangewaziyê de şiyana xizmetê tê diyarkirin û biryar li ser cihê xizmetê û dema destpêkirina xizmetê tê girtin.

Piştî bangewaziyê

Nameya leşkerî ya nû (Alokaskirje): Erkdar beriya destpêkirina xizmetê nameyekê werdigire ku tê de hûrgiliyên zêdetir derbarê cihê xizmetê û ketina nava xizmetê de tên behskirin.

Destpêkirina xizmetê: Ketina nava xizmetê di dema diyarkirî de pêk tê. Di heyama rojên pêşîn de bi jîngeha xizmetê û şewaza rojane re tê nasîkirin, alaviyan werdigire û kontrola tenduristiyê ya pêwîst tê kirin. Digel vê yekê, rahênana hevpar dest pê dike.

Ofîsa herêmî di destpêka sala bangewaziyê de, biryarnamaya bangewaziyê bi riya posteyê di dema guncaw de beriya roja bangewaziyê ji kesên bangkirî re (di wê salê de ku dibin 18 salî) dişîne. Bi riya vê agahdariyê dîrok û cihê bangewaziyê tê diyarkirin. Di heman demê de, erkdar pirsnameya peywendîdar a bi xizmeta leşkerî û rêbernameyên kontrola bijîşkî û rêbernameya erka giştî dibin.

Di rûniştina bangewaziyê de, agahdariyên kesane, rewşa tenduristiyê tên kontrolkirin û daxwazên peywendîdar ên bi xizmeta leşkerî tên guhdarîkirin. Li ser bîngeha agahdariyên berdest di bangewaziyê de, guncawbûna ji bo xizmeta leşkerî yanî şiyana xizmetê tê diyarkirin. Digel vê yekê, di bangewaziyê de dem û cihê xizmetê an lêborîna ji xizmetê biryar li ser tê girtin.

Di bangewaziyê de, eger ciwan di kontrola bijîşkî de ji bo xizmetê bi şiyana derket, ji bo xizmetê tê danîn. Bijîşk şiyana xizmetê li ser bîngeha qanûnên berdest û rêbernameya kontrola bijîşkî ya Hêzên Parastinê diyar dike.

Beşdariya di rûniştina bangewaziyê de bi awayekî kesane neçarî ye. Mûleta beşdarnebûnê di bangewaziyê de tenê ofîsa herêmî dikare derxîne. Eger ciwanekî şiyana wî nebû ku di rûniştina bangewaziyê de li gorî agahdariya bangewaziyê beşdar bibe, divê peywendiyê bi ofîsa xwe ya herêmî re bike. Neçûyîna ji bo bangewaziyê bêyî sedemeke yasayî ya rewa (ji bo nimûne nexweşîyeke giran) li gorî qanûna erka leşkerî karekî cezayî ye.



**Civaka
Fîlandiyayê
hêjayî parastinê
ye.**

BÛYER

Avakirina arasteyeke hevpar

Di Komeleya MVM ry de, em dixwazin her tim hem çalakiyên xwe û hem jî jêhatiniya endamên tîma xwe pêş bixin. Xebata amadebaşiyê ya bi kalîte û bi bandor pêdivî bi wê yekê heye ku em bixwe jî tiştên nû fêr bibin, xebatên xwe bi rexneyî binirxînin û arasteyeke hevpar a xurt ava bikin.



Di meha Tebaxê de, tîma me hemûyan çend roj bi hev re derbas kirin di bin sernavê pêşîn, çalakiyên TYHY (Pêşxistina xweşguzariyê li ciyê kar) û xebata stratejîk. Ji ber ku endamên nû gihîştine koma me, dema hevpar derfeteke hêja ji bo naskirinê, hevnasînê û ronîkirina nirxan, armanc û arasteya pêşerojê ya komê peyda kir.

Di nav van rojan de, fêrbûn, plansaziya stratejîk û xebata hevpar tevlihev bûn. Dema ku em şîyanên tîma xwe û hevdu çêtir ji berê nas dikin, em dikarin hevkarîyeke xurttir ava bikin, çalakiyên xwe bi awayekî plankirî pêş bixin û bi xurttir bersiva zehmetiyên ewlehiyê yên civakê bidin.

Civînên agahdariyê
yên Îlone

Di meha Îlonê de, em zincîra civînên zanyariyan ên MVM ry ku ji bo vê salê ji bo komên ziman û arasteyên cihêreng plan kirine, didomînin. Armanc ew e ku zanyariyên nû û bi hêsanî fêmkirî derbarê ewlehiya giştîgîr, amadebaşî, parastina niştimanî û bangewaziyên Fînlândiyayê de pêşkêşî wan kesan jî bikin ku sîstema fînlandî ji wan re biyanî ye.



CIVÎNA ZANYARIYAN BI ZIMANÊ EREBÎ



Pêncşem, 3ê Îlona 2026an



17.00–19.00



Suomi-Syyria Ystävyyssseura ry
Kutojantie 3, 5. kerros,
02630 Espoo



CIVÎNA ZANYARIYAN BI ZIMANÊ RÛSÎ



Yekşem, 6ê Îlona 2026an,



15.00–17.00



SVK Liitto ry
Sienitie 18 B
00760 Helsinki

Girêdanên tomarkirinê û zanyariyên nû derbarê bûyeran de dikarin li malpera Komeleya MVM ry werin dîtin.

BANGEWAZIYÊN SALA 2026AN

ZANYARIYA EWLEHIYA GIŞTGÎR Û

BERPIRSIYARIYA HEVPAR JI BO CIWANAN



Bangewaziyên sala 2026an dest pê kirine. Îsal nêzîkî 38.000 kesên bangkirî beşdarî bangewaziyan dibin û bi giştî li 245 cihan li seranserê Finlandiyayê civîn tên lidarxistin. Mêrên ku di sala 2008an de hatine dinyayê di nava nobeta sereke ya bangewaziyê de ne, û bangewazî heta 15ê kanûna pêşîn didomin.

Digel vê yekê, dahênana herî giring a îsal ne tenê bi roja rastîn a bangewaziyê re têkildar e, belkî bi wê yekê re têkildar e ku çawa zanyariyên ewlehiya giştî û parastina niştimanî di qonaxeke zûtir de digihîjin ciwanan.

ROJÊN ZANYARIYA BANGEWAZIYÊ BI AWAYÊ CERIBANDINÎ LI ESPOO, IISALMI Û JYVÄSKYLÄ

Di payiza 2026an de, ji bo cara yekem li Finlandiyayê roja zanyariya bangewaziyê ya ku ji bo tevahiya temenî hatiye diyarkirin, bi awayê ceribandinî tê lidarxistin. Ev ceribandin li Espoo, Iisalmi û Jyväskylä tê birêvebirin û arasteyî ciwanên 17 salî – hem keç û hem kur – hatiye kirin ku li amadeyiyan û navendên perwerdehiya pîşeyî yên herêmê dixwînin.

Armanca rojên zanyariyan ew e ku zanyariyên giştî derbarê parastina niştimanî, erka leşkerî, xizmeta leşkerî ya xwebexş a jinan û ewlehiya giştî de hêj beriya temenê bangewaziyê bidin ciwanan. Di heman demê de di van rojan de şiyana xebata rojane, xweoragiriya derûnî û xweşguzariya ciwanan tên nîqaşkirin. Ev projeyeke mezin e: Bo nimûne li Espoo, 11 amadeyî û navendên pîşeyî beşdarî rojên zanyariyan dibin ku bi riya wan nêzîkî 3.400 xwendekar digire ber xwe. Hêzên Parastinê, wezaretên cihêreng, Rêxistina Perwerdehiya Parastina Niştimanî (MPK), şaredarî û navendên perwerdehiyê di pêkanîna vê yekê de beşdar in.



KOMELEYA MVM RY PIŞTGIRIYA MALBATÊN BI PAŞXANEYA PENABERAN DIKE

Komeleya Amadebaşî û Parastina Niştimanî ya Penaberan (MVM ry) dixwaze piştrast bibe ku zanyariyên bangewazî û ewlehiya giştî a Fîlandiyayê bi zelaî û vekirî bigihîjin ciwan û malbatên bi paşxaneya penaberan.

Em di dîrokên 3 û 6ê Îlonê de civîna zanyariyan birêve dibin ku tê de amadebûna rojane, ewlehiya giştî û pêvajoya bangewaziyê tên nîqaşkirin. Armanca ew e ku sîstema fîlandî ji bo wan malbatan jî fêmkirî û nêzîk bikin ku erka leşkerî an sîstema parastina niştimanî ya Fîlandiyayê ji wan re biyanî ye.

NÊRÎNEK LI PÊŞEROJÊ (2027–2028)

Ceribandina sala 2026an tenê gava yekem e di nava çaksaziyeke civakî ya berfirehtir de. Li ser bingeha ezmûnên ku di vî pîlotî de hatine bidestxistin, biryar e model di salên 2027–2028an de ji bo tevahiya welêt were berfirehkirin.

Di pêşerojê de, zanyariyên peywendîdar ên bi ewlehiya giştî û amadebaşiyê bi awayekî wekhev digihîjin tevahiya temenî – ji bo avakirin û çêkirina Fîlandiyayeke xurttir, yekgirtî û ewletir ji bo me hemûyan.

MMVM RY DI 3 Û 6Ê ÎLONÊ DE CIVÎNÊN AGAHDARIYÊ LI DAR DIXE.

Ji bo AGAHİYÊN ZÊDETIR, LI RÛPELA BÛYERAN BINÊRE.

DENGÊ JINAN



Najma Hirsi

“

**EZ JÎ DIKARIM
BI BEŞDARIYA
XWE EWLEHIYA
HEVPAR AVA
BIKIM.**

Ewlehiya yê her kesî ye

Ji bo Nejîme Hîrsî ya ku paşxaneya wê somalî ye, çalakîyên Komeleya MVM ry nêrîneke nû di warê amadebaşî, ewlehiya giştîgîr û wê yekê de ku çawa her kes dikare di avakirina civakeke ewletir de beşdar bibe, girtiye dest. Di vê hejmarê KANTAMA de, mijar ji bo wê pir taybet e: birayê wê niha xizmeta xwe ya leşkerî li Fînlândiyayê pêk tîne. Di ezmûna Nejîmeyê de du mijarên sereke ji bo pêşeroja civaka me tevlihev dibin – rola çalak a jinan di xebatên ewlehiyê de û girêdana bêqût a kesên bi paşxaneya çandî ya cihêreng wekî beşek ji ewlehiya giştîgîr a Fînlândiyayê.

«Ez bi riya çalakîyên Komeleya MVM ry ve derfet dîtîme ku gelek tiştên nû derbarê amadebaşî, ewlekarî û civakîbûnê de fêr bibim. Beşdariya di çalakîyan de nêrîneke nû ji min re vekirîye ku çawa her kes dikare bi beşdariya xwe di avakirina civakeke ewletir de beşdar bibe.

Ji bo min di çalakîyên Komeleya MVM ry de ew yek bi taybetî girîng bûye ku mirov dikare ji paşxane û xala destpêkê ya cihêreng were navê. Ez bixwe di bin siya du çandan de mezin bûme, û ez hîs dikim ku paşxaneya min çalakîyê dewlemendtir dike. Xweş bûye ku min dîtîye ku ezmûnên cihêreng ne asteng in, belkî hêzek in ku pireyan çêdikin û xweoragiriya hevpar li hemerî qeyranê xurt dikan.

Ez bi riya çalakîyan fêrî wateya amadebûna kiryar bûm û herwiha çendî girîng e hevkarî, xweoragiriya derûnî û alîkariya kesên din di rewşên qeyranî yên cihêreng de. Di heman demê de min bawerbiqewetî û wêrekiyeke zêdetir ji bo beşdariya di gotûbêja civakî de bi dest xistiye. Komeleya MVM ry civakek ji min re peyda kiriye ku tê de her kesek rola xwe ya girîng heye.

Wekî jinekê, ez vê yekê pir pêwîst û girîng dibînim ku jin bi çalakî di wan xebatan de beşdar bin ku bi ewlehî û amadebaşiyê re têkildar in. Ewlehiya yê her kesî ye, û tu carî nebe tenê mijara komeke mirovan. Her yek ji me derfeta me heye ku jêhatîniyên girîng ên jiyana xwe fêr bibin û para xwe bînin cih.

Ev mijar ji bo min hîn kesîtir bûye niha ku birayê min xizmeta xwe ya leşkerî li Fînlândiyayê pêk tîne. Bi riya geştê wî min derfet dîtîye ku ji nêz ve çavdêriya wê yekê bikim ku girtina berpirsiyariyê û parastina niştîmanî di meriyetê de digihêje çî. Ev yek têgihîştineke kûr di min de çêkiriye ku çendî girîng e civaka me zanyarî, jêhatîbûn û amadebûna derûnî hebe ji bo xebatê heta di rewşên dijwar de jî.

Çalakîyên Komeleya MVM ry pir ji wê zêdetir dane min ku tenê zanyarî bin. Ew hest daye min ku ez jî dikarim bi para xwe kar ji bo ewlehiya hevpar bikim. Ez dixwazim di pêşerojê de jî tiştên nû fêr bibim, amadebûna xwe pêş bixin û bi wêrekiyê ve bixwazim jinên din û kesên bi paşxaneya cihêreng werin ser mêza hevpar.»

DIBISTANAN DEST PÊ KI - BI EWLEHÎ BI BISIKLÊTÊ DI TRAFÎKÊ DE

Dibistanan careke din dest pê kiriye û her roj hejmareke pir ji zarok û ciwanan li kolanên tîn dîtin. Amadebûna rojane û pêşbînîkirin ji ber deriyê malê dest pê dike, û baş e em ji bîr nekin ku qanûn û rêzikên trafîkê yên Finlandiyayê dibe ku ji wanên li deverên din ên cîhanê hatine dîtin cîyawaz bin. Ji ber vê yekê em dixwazin bisiklêvaniya ewle bi bîra zarokên hûr, ciwan û mezinan binin – û daxwazê ji dê û bavan bikin ku qanûnên ewlehiyê bi hev re bi zarokan re bixwînin.

LI KU DERÊ DIVÊ BI BISIKLÊTÊ BIÇÎ?

Bisiklêt li Finlandiyayê bi fermî wesayîtek e (amûreke veguhestinê ye). Eger li ser rêça rê reça bisiklêtê hebe, bisiklêvan divê di rêza pêşîn de ji wir sûd werbigire. Di nebûna rêçikeke bisiklêtê de, li kêleka rastê ya rê an şana rê dimeşin. Ajotina bisiklêtê li ser piyan (rêça peyayan) tenê ji bo zarokên bin 12 salî hatiye destûrdayîn, bi merteba ku zirarê nede peyayan.

QANÛNÊN MAFÊ PÊŞENGIYÊ Û PÊŞBÎNÎKIRINÊ JI BÎR NEKIN.

Xeta derbasbûna peyayan bi awayekî otomatîk mafê pêşengiyê ji bo bisiklêvan misoger nake. Bisiklêvan xwediyê desthilatê ye ku li ser xeta peyayan derbas bibe, lê berpirsiyariya mafê pêşengiyê her dem li gorî nîşanên trafîkê yên çarriyan, qanûn û nirxandina rewşê tê diyarkirin. Dema ku bisiklêt bi dest li ser xeta peyayan tê birin, bisiklêvan dibe peya. Her dem aqilane ye ku bi aramî bigihîjî çarriyan, li dorhêlê binêrî û piştrast bibî ku bikarhênerên din ên rê bi temenî hay ji te hebûn.

BISIKLÊTÊ AMADE BIKE Û REWŞA WÊ KONTROL BIKE.

Beriya destpêkirina rêça dibistanê, pêwîst e rewşa bingeheîn a bisiklêtê were kontrolkirin: fren, teker, zincîr, çira û rengvedêr. Di dema tevgerê de di tariyê de û di dema tarî-roniyê de, çira pêşî ya spî an zer a ronî û çira paşî ya sor ku qanûn dixwaze, ji bo dîtin û ewlehiyê pir girîng in.

KASKÊ EWLEHIYÊ LI SERÎ BIPARÊZE – MÎNAK BIN.

Bikaranîna kaskê ewlehiyê karekî ewlehiyê ye. Piştrast bibe ku kask saxlem e, pîvana wê guncaw e û bi awayekî rast hatiye girêdan. Erka mezinan e ku mînak bin: çandatiya ewlehiyê bi riya kiryanan digihîje zarokan, û kask divê hem li serê mezin û hem jî zarokan hebe.

GEŞTA HEVPAR BER BI EWLEHIYÊ VE.

Baş e dê û bav beriya destpêkirina sala xwendinê, rêça dibistanê bi hev re bi zarok re bi peyatî an bi bisiklêtê derbas bikin, û baleke taybet bidin ser çarriyanên qelebalix û cihên derbasbûna rê. Ji bîr neke ku rêça herî kurt her dem ya herî ewle nîne. Bikaranîna telefona bîqîmet di dema bisiklêvaniyê de xetere ye – eger neçar bî li peyamekê an nexşeyekê binêrî, pêşî li cihekî ewle bisekine.



BERPIRSIYARIYA AJOKARAN JÎ DIGIRE BER XWE.



Koulujen alkaessa liikenne vilkastuu. Kuljettajien tulee hidastaa vauhtia erityisesti koulujen, risteysten ja suojateiden läheisyydessä, pitää huomio tiiviisti liikenteessä ja olla valmiina myös odottamattomiin tilanteisiin.



Rêya dibistanê ya ewle û amadebûna rojane mijara hevpar a me hemûyan e. Zanîn û rêzgirtina qanûnên trafîkê alîkariya me hemûyan dike ku bi ewlehî tev bigerin – bêtî ku girîng be em çiqas dem li Finlandiyayê dijîn.

Çavkanî: Traficom – Pyöräilijän liikennesääntöopas; Liikenneturva.

DEMA KU XIZMET HÊJ DEST PÊ KIRIYE

TVê carê di stûna dengê ciwanan de, em ezmûneke hinekî ciyawaz ji hejmarên berê dibihîzin. Hevpeyvînkiriyên me yên berê behsa xizmeta xwe ya leşkerî kirine piştî ku bi dawî bûye, lê vê carê ciwanek dengê xwe derdixe ku niha xizmeta xwe pêk tîne.

Bi çi nêrînê çûyî leşkeriyê? Li bendê bûyî ku xizmet çi be?

«Ez bi nêrîneke bîryardar çûm leşkeriyê. Ji destpêkê ve min dixwest karê xwe bi başî bikim û wêneyekî baş ji xwe li pey xwe bihêlim. Ez amade bûm ji bo wê yekê ku sibeha zû, guhdariya fermanan û gelek rahênanên laşî dê li pêşiyê bin. Tirsake min a taybet nebû. Di destpêkê de min hinekî li ser wê yekê difikirî ku jiyan li jûreke yekane bi komeke mirovan re wê çawa be û gelo ez ê zimanê hevpar bi hemûyan re bibînim an na.»

Xizmeta leşkerî niha çawa ye? Tiştê herî dijwar çi bûye?

«Niha xizmet bi başî birêve diçe. Piştî çend hefteyan, mirov bi rîtmê nû ya rojane, dema xewê û rûtîna rojane ya leşkeriyê re fêr dibe. Tiştên herî dijwar ji bo min heta niha xûlên daristanan bûn. Rojên daristanê dikarin giran bin, û xewa di konê de ku ciyê de kesî tê de hebe pêdivî bi xwecihêbûnê heye. Di daristanê de rewşên nediplomatîk tînin pêş, û heta dema ku mirov westiyayî jî be divê mirov bikaribe heta ku pêkan be bi awayê çêtirîn kar bike. Ev yek hem xweoragiriya laşî û hem jî ya derûnî pêş dixê.»

Li leşkeriyê tu çi fêr bûyî? Xizmetê çi tiştek daye te?

«Di rahênanên daristanê de, min jêhatiniyên kiryarî yên rojane û amadebaşî wekî vêxistina rast a agir û herwiha vedan û komkirina lezgîn a kon fêr bûme. Ez herwiha fêr bûm ku bi bandortir kar bikim û heta dema ku dem kêr e hamû alavên xwe biparêzim. Digel vê yekê, guhertina herî mezin di nerîna min de li hemberî dem û civakê çêbûye. Li leşkeriyê min demnasî û wê yekê fêr bûm ku em rêz li demên lihevkiyê û hevalbendên tîmê bigirin. Demnasî û bawerî qanûnên zêrîn ên leşker in.»



Ji destpêkê ve min dixwest karê xwe bi başî bikim û wêneyekî baş ji xwe li pey xwe bihêlim.



KANTAMA û Komeleya MVM ry hêviyê ji wî re dixwazin:

Di berdewamiya xizmetê de em serkeftinê, gelek ezmûnên nû û dersên bi qîmet ji te re dixwazin! Ji hemû derfetên mumkun ên xizmetê sûd werbigire û bi wêrekî ve dest bide ser wan derfetên ku di dema wê de tînin vekin. Di xizmeta leşkerî de mirov dikare sînorên xwe biceribîne, hêzên nû bibîne û berpirsiyariyê wekî beşek ji civakê hilbigire. Eger serokatî balkêş be, dibistana pîledaran (AUK) û dibistana efserên yedek (RUK) dikarin rêgeheke tam nû vekin û jêhatîniyeke serokatîyê ya bi qîmet pêşkêş bikin ku heta jiyanê sivîl û rêça pîşeyî dê bikêrhatî be.

Fînlândiyayê pêwîstiya xwe bi ciwanên bi şîyan, berpirsiyar û pêbawer heye. Spas ku te ezmûna xwe bi me re parve kir!

Ferhenga Leşkerî

ALOKAS

Leşkerê ku nû xizmeta xwe dest pê kiriye (leşkerê sifir).

PUNKKA

Ciyê xewê yê leşker (textê xewê).

ALIKKI, ALIKESU

Pileya serçawîş (Alikersantti).

SIPA

Paqijiya navxweyî an derveyî ya ku leşker cihên giştî paqij dikin.

GONAHTAA

Windaforma moral û vînê, xwebidestdan, westiyan.

SKAPPARI, SKAPU, KAPIAINEN

Karmendên leşkerî yên bi meaş (kadroyên profesyonel).

HÄRVÄTÄ

Kirina karê zêde yê bêwate, tevlihevî an tevgerîn di dema fermanên hişyariyê de.

SOTKU, SODE

Kafêya leşkerî (Sotilaskoti).

JÄKKI

Kursiyek an sekoyeke biçûk a leşkerî.

SÄRMÄTÄ

Amadekirin an rastkirina alav û cilên leşkerî li gorî pîwaran.

JÄPITTÄÄ

Sekinîn an rûniştin bi awayê leşkerî bêtê tevger wekî peykerekî.

SÄRMÄ

Leşkerê ku pir paqij û rêkûpêk xuya dike.

KOKSU, UPSKOK

Xwendekarê efseriyê (Upseerikokelas).

TEKSI, TKS

Dolab û rêzicknameya paqijiyê ya ku divê beriya çûyîna mûletê were bicihanîn.

MOVE, MOVETTA

Revîn ji xizmetê bi behaneya nexweşî an birîndariya çekirî.

TETSATA

Rêbazên pêşveçûna leşker li qada şer (êrîşbirin û bi zik ve çûn).

MUKE

Navenda pêşwaziyê / xwaringeha leşkerî (Muonituskeskus).

TJ

Jimartina berevajî ya rojên mayî yên leşker.

NOHEVA

Kurteya peyvên «lezgîn-cîbicî-amade» (leşkerê zîrek û karîger).

VEKSI

Nexweşxaneya qışleyê / leşkerî.

PINKKA

Bergê betaniyê ku bi awayekî pir rêkûpêk li ser sekoyê hatiye qatkirin.

VEMPPA

Leşkerê VMTL ê ku ji rahênanên erdî, şer û werzişê azad e.